

Gelo we heye «Sihr li dijî
Sihrbaz biqulibê»?

»»» R:8



Şoreşa
azadiyê.. Şoreşa exlaqî

»»» R:5

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (432) 07-10-2022 Buha (1000) Tûmen

Rojhilatî bêgavî wê
serbikevin.

»»» R:6

Biryarnameya xwepêşandanên
piştevanîkirina serhildana xelkên
Îranê li ye

»»» R:7

**Mîstefa Hicrî: Girtiyên siyasî ji her demê zêdetir di bin metirsiya tinekirin, jeno-
sayd û tolhildana rejîmê de ne**

Berpîrsê Navenda
Birêveberiya Giştî ya
PDKÎ, “Mîstefa Hicrî”
derheq agirgirtina cihê
şikê ya girtîgeha Êvînê
peyamek belav kir.

**Deqa Peyamê wiha
ye:**

**Xelkê mafxwaz ên
Îran û Kurdistanê!**

**Malbatên girtiyên
siyasî!**

Çed şev bi ser agir-
pêketina cihê şikê ya
girtîgeha Êvînê re der-
bas dibe; Bûyerek ku
di germahiya hêrsa ce-
mawerî ya ser şeqam
û pêla bê eman ya kîn
û nefreta kombûyiya
ser hev ya xelkê li dijî
rejîma cinayetkar û
terorîst, bala raya giştî
ya Îranê û rêxistinên
mafê mirovî yên
cîhanî bo aliyê xwe
rakêşa.

Girtîgeha Êvînê ji
aliyekî ve sembola
berxwedanî û îradeya
bênavber a hezaran
şoreşger û têkoşerên
neteweyên Îranê ye,
û ji aliyek din ve jî,
sembola berdewam-
bûna siyaseta kuştar,
îşkence û qirkirina
Komara pet û sêdare
ye; Herçiqas ku heta
niha aliyên wê bûyera
dilêş rohn nebûne,
lê tawan û pîlanên
Komara Îslamî cihê



gumanê ne.

Ev bûyera dilêş, eger û metirsiya dûbarebûna karesateke din wek komkujiyên dehika 60ê ya Rojî, û tawanên mîna vê yekê yên vê rejîmê li pey e. Her lewma divê em bi nîgeranî ve lê binêrin, bi taybetî ku di heyama mehek derbsbûyî de, û di encama serkutkirina bêrehmane ya xelkê serhildêr û girtin û bêserûşûnkirina hezaran kes ji xortên azadîxwaz, metirsiya tinekirin, qirkirin û tolhildanê ji aliyê Ko-mara Îslamî ve ji her demê zêdetir tê sehkirin.

Xelkê azadîxwaz ên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ku armanca wan rûxandin û berevajîkirina tomara rejîma Komara Îslamî ye û kolan û çeperên berxwedanê çol nakirine; Divê em azadiya girtiyên siyasî ji xwe re bikin silogan, û herwisa sembolên berxwedanî û xweragiriyê zêdetir bidin ber çav. Divê çar-enivîsa xortên xwe di girtîgehê de ji bîr nekin, û pêşiya dûbarebûna karesatek mezintir bigirin. Herwiha em daxwazê ji saziyên mafê mirovî dikin ku lêkolînê li dosyayên vê dawiyê yên girtîgeha Êvîn û girtiyên siyasî yên di nav çalên reş ên rejîmê de ne bikin, da ku kiryarên hovane û nemirovane yên vê rejîma faşîst û mirovkuj zêdetir bê derxistin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Navenda Birêveberiya Giştî

Mîstefa Hicrî

26`ê Rezbera 1401`an

Girûpa hekêriya “Bilek Rîward” 24 demjimêr bi Îranê re derfet daye ku binçavkiriyan azad bike

Piştî ku girûpa hekêriya “Bilek Rîward” hesabên bikarhênerî yên Kompaniya Berhemanîn û Geşedana Wizeya Navkî ya rejîma Îranê hek kir, 24 demjimêr dem bi Îranê re da ku binçavkiriyan azad bike.

Girûpa Hekêriya “Bikel Rîward” bi rejîma Îranê re huşdarî daye ku eger heta 24 demjimêran daxwaziyên xwenîşanderan qebûl neke û tevahiya girtiyên siyasî, hizrî û xwenîşanderên binçavkirî azad neke, dê hemû belgeyên bernamêya navkiya rejîma Îranê belav bike.

Herwisa vê girûpa hekêrî bi tekezî gotiye: “Rejîma Îranê ti çareyek bilî azadkirina girtiyan û ragirtina serkutan û teslîmbûn li hember daxwaziyên xelkê nîne ku bi wateya dawîya Komara Îslamî ya Îranê ye”.



Xwendekar û dersxwan şeqaman çol nakin

Xwendekaran li parêzgehên “Tehran, Tewrêz, Gîlan û Mazenderan”ê bi awayek berfireh li dijî rejîma Îranê û piştevanî ji serhildana Kurdistan û Îranê xwenîşandan kirin.

Îro Sêşemî 26ê Rezberê, li bajarê Tehranê xwendekaran li zanîngehên “Xacê Nesîr Tûsî, zanîngeha Huner, zanîngeha Ellame û herwisa di zanîngeha Kerecê de jî li dijî rejîma Îranê û piştevanî ji serhildana xelkê Kurdistan û Îranê xwenîşandanên berfireh lidar xistin.

Di bajarê Tehranê de xwendekar û dersxewan siloganên wiha dan “ kuştin



û teqe kirin û agir berdan Êvînê, gotina me rast bû bersiva wan gulle bû û dehan siloganên din dan” herwisa li zanîngeha Hunerê jî bi awayek sembolîk pê xwe li ser erdê kutan.

Xwendekarên zanîngeha Yasayî ya Ellame ya Tabatabayî ya Tehranê bi siloganên bêşeref bêşeref bersiva Elî Behadorî Cehromî, berdevkê rejîma Îranê ku çûbû zanîngehê, dan.

Hevdem li zanîngeha Gîlanê, xwendekar rijiyane ser şeqaman û kur û keçên xwendekar xwenîşandane berfireh bo piştevanîkirin ji serhilderana seranerî lidar xistin û siloganên wek “ne xavik, ne serkut, beranerî û azadî, jin jiyan azadî” dan.

Herwisa li bajarê Tewrêzê xwendekaran kombûn û silogan dan.

Di parêzgeha Mazenderanê de jî xwendekar hatine ser şeqaman û hûre ji besîc û hêzên ewlehî kêşan û silogana “jin jiyan azadî, mêr welat avedanî” dan.

Li çend girtîgehên Îranê de alozî derket

Duh şev girtîgeha Êvîn a Tehranê li benda 7 û 8 agir pê ket û çirûsikên agir heta mesafetên dûr xuya bûn û hevdem digel agir pê kevtinê dengê teqînên mezin û guleyan jî dihat bihîştin.

Hevem digel agir girtina bendên 7 û 8 yên girtîgeha Êvîna Tehranê, li girtîgeha Sine û Lakana Reştê jî şer û pevçûn û agir pê kevtin hebûye û pêka serçaveyên nefermî, di encama agir agirtina girtîgeha Sine de aliyê kê 60 girtî birîndar bûne û li girtîgeha Lakan a Reştê de jî ku tenê alozî hebûye 20 girtî hatin e kuştin.

Pêka zanyariyên nefermî ku hatine belavkirin dibe ku ew aloziyên li girtîgehên rejîmê de pîlanên rejîmê bixwe bin ji ber ku, li demjimêr 9`ê şevê li girtîgeha Êvînê de dema bêdengî û xevê ragihandine û hêzên rejîmê yên ber deriyê girtîgehê jî di amadebaziya de bûne û interneta telefonan jî qut kirine.



Navenda Hevkarî: Em ê roja Şemî bi grevê bersiveke guncaw bidine tepeserkerên rejîma Îranê

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê di daxuyaniyekê de piştevaniya xwe ji bang-hêjiya xwenîşandana roja Şemî ya li Berlînê nîşan da û banga grevê û nerazîbûna giştî li Îran û Kurdistanê jî kir.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Xelkê xebatkarê Îranê!

Îraniyên li diasporayê!

Di deştpêka meha duyemîn a serhildanên girseyî yên li dijî Komara Îslamî de, rejîmê bi tundûtîjiya zêde ve tepeserkirina hovane û dûbarekirina tawana kuştina zarokan berdewam dike. Girtîgeh tijî ne ji xwenîşanderên têkoşer û gelek bajar bi tundî hatine mîlîtarîzekirin.

Ji aliyê din vejî, tevgera girseyî ne tenê di nava Îranê de piştgiyêke mezin bi deşt xîstîye, belkî Îraniyên li derve jî, tevî her cudahiyeke siyasî, zimanî û çandî, mil bi milê xebat û berxwedaniya xelkê Îranê bi şeweyekî bêmînak hatine qadan û piştevaniya berfireh ya xelkê



cîhanê bo wê serhildana cemawerî rakêşane.

Roja Şemîya bê, 22ê Çiriya Pêşîn, yekem Şemîya meha duyemîn a xwenîşandanên cemawerî, hemû xelkê Îranê li seranserê cîhanê bi îradeyeke yekgirtîtir ji hertimî, biryara xwenîşandaneke mezin dane.

Rêzdar Hemîd Îsmâîliyên, berdevkê encûmena malbatên qurbanîyên balafira Ukraynayê, vê carê banghêjiya xwenîşandaneke mezin li bajarê Berlîna Almanyayê kiriye. Em piştgiyê didin vê banghêjiyê û beşdariya çalakane ya wê xwenîşandanê dikin. Em daxwazê ji hemû Îraniyan û bi taybetî Kurdên li Almanyayê û Ewropayê dijîn, dikin ku beşdariyê

di xwenîşandanên li Berlîn û paytextên din yên Ewropayê de bikin.

Herwiha em daxwazê li hemû xelkê seranserê Îranê, aliyên siyasî û çalakvanên siyasî û sîvîl dikin ku roja Şemîyê 30ê Rezerberê, ji demjimêr 12ê nîvro pê ve li seranserê Îranê deşt bi grev û xwenîşandanê bikin da ku bersiveke guncaw bi serkutkar û tepeserên zarok û bendkiriyan girtîgeha Êvînê re be.

Em daxwazê li hemû wan aliyên siyasî yên ku dixwazin rejîmê biherife, digel wê banghêjiya di navendê de, beşdariyê di wê xwenîşandana giştî li seranserê Îranê bikin da ku em hemû “na”yeke din a mezin bidin Komara Îslamî.

Jin, jîyan, azadî

Serkevtin ji bo serhildana demokrasîxwazî li Îranê

Mirin û neman bo Komara Îslamî û yasayên wê yên dije jinî


Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê

Urmiye; 18kes xelkê gundê Balayê qedera wan nexuya ye û di bin îşkenceyê de ne

Piştî xwenîşandana 4ê Rezerberê ya xelkê serhildêrên gundê Balayê yê ser bi bajarê Urmiyê, ku çendîn kes ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine şehîdkirin û birîndarkirin, hêzên ewlehî yên Spaha Pasdaran a terorîst deşt avêtin bi girtina bi kom a welatîyan.

Li gorî çavkaniyek aghedar, welatîyek Kurd yê bi navê “Şoreş Îslam Sêkanî” yê xelkê gundê Balayê çend roj bû di yek ji girtîgehên ewlehî yên Spaha Pasdaran de bi tundî dihate îşkencekirin.

“Şoreş Îslam Sêkanî” duh di pêwendîyeke kurt a telefonî digel malbata xwe de ragihandiye, ku piştî gelek caran lêpîrsîn û îşkenceyên giran li



navendeke ewlehiyê ya Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya vî bajarî hatiye veguheştin.

Çavkabniyek aghedar jî, bi malpera “Kurdistanmedia”yê re ragihandiye: “Welatîyekî, Kurd yê xelkê gundê “Bala”yê yê bi navê “Deriyûş Xêrî” jî, di yek ji girtîgehên Ewlehî yên Spaha Pasdaran de ye û bi tundî tê îşkencekirin.”.

Wê çavkaniya aghedar di berdewamiyê de daye zanîn ku: “Piştî xwenîşandanên li Balaya Urmiyê nêzî 26 kesan ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine girtin û piştî îtirafên bi zorê û îşkenceyan, 8 jî wan bi barimteyên giran hatine berdan û 18 kes jî wan jî, hêj di girtîgehên ewlehî yên Spaha Pasdaran de ne û raştî îşkenceyên giran tên.

Konferansa Navxweyî ya PAKê bi dawî hat

Konferansa Navxweyî ya Partiya Azadiya Kurdistan-bakur (PAK), bi beşdariya nûnerên teşkîlat û rêxistinên vî partiyê yê li Kurdistan, Tirkîye û Ewropayê, di 15-16ê Cotmeha 2022an de ku li Diyarbekirê hatibû lidarxistin û konferans bi dawî hat.

PAKê di konferansa xwe daye zanîn ku “îro rojê li Bakurê Kurdistanê pêwîstîyeke sereke ya gelê me, ava kirina Navenda Hevkarî ya Neteweyî, Demokratîk e.”

Herweha PAK dibêje, “amade ye li ser her daxwazeke netewî ya miletê Kurd bi her alîyekê re kar û xebat û hevkarî û diyalogên pêwîst pêk bîne.”

Sê xalên rojeva Konferansa Navxweyî ya PAKê hebûn. 1 Xala yekem: Nirxandina 8 salên PAKê û ji bo rojên pêş, tesbîtîkirina nexşerê û bernameya xebatê ya PAKê. 2: Nirxandina siyaseta PAKê ya di derbarê Parlamentoya Tirkîyeyê û hîlbijartinan de. 3: Nirxandina siyaseta PAKê ya li Bakurê Kurdistanê di derbarê yekîtîya siyasî û rêxistinî, tifaqa neteweyî demokratîk, peywendiyên hêzên neteweyî yê li her çar perçeyên Kurdistanê û siyaseta PAKê ya di derbarê hevkarî û diyalogên li gel aliyên Tirkîyê de.”

Partiya Azadiya Kurdistan-bakur (PAK) di 18ê Cotmeha 2014an da li Amedê hatiye damezrandin.



Daxuyaniya 500 siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd li Bakûrê Kurdistanê li derheq piştgiya serhildana Rojhilatê.

Ji bo piştgiya serhildana gelê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, 575 siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd daxuyanîyeke çapemenîyê belav kirin. Tekêsta daxuyanîyê ya bi kurdî (Kurmançî û Kirmanckî/Zazakî) û bi tirkî, li gel navê kesayetên ku daxuyanî îmze kirine li xwarê ne:

Em Silav li Berxwedana Mafdar û Meşrû ya Gelê Îranê û Rojhelatê Kurdistanê Dikin!

Keça Kurd Jîna Emînî ya ku ji aliyê polisên dewleta dagirker a Îranê ve bi êşkence û lêdanê hate qetilkirin, di dema merasîma axsipartina wê de li bajarê Saqiza Rojhelatê Kurdistanê, xwepêşandana deşt pê kirin û ew xwepêşandan li hemû bajarên Îranê belav bûn. Bi tevî hemû zixt û zordariya Dewleta Îranê, tevgera sivil a xelkê li her derê bajarên Îranê belav dibe û geş dibe. Ev xwepêşandan/raperîn, bi piştgiyê û berxwedana grubên bindest ên netewî, etnikî, mezhebî û jinan li tevgerê Îranê hêsekê mezin û tevgerê berxwedanê derxistîye meydanê.

Rejîma Îranê rejîmeke otokratîk/despotîk a weha



ye ku bi tu awayî rêz li mafên mirovan, wekhevî û mafê jinan, mafê netewî û demokratîk ên nasname û kulturên cîyawaz nage û qebûl nake. Îranê, kariye heta îro gelek netewe û gurubên etnikî yê wekî Azerî, Kurd, Belûc û Ereban bi zixt û zordariyê di bin serweriya neteweya Faris û nasnameya Îranî de ligel hev bigre. Digel van hemû zixt û zordariyan, grubên etnikî û neteweyî yê li Îranê, daxwaza sistemekê federalî dikan.

Ev tevgera berxwedana ku bi çirûska bûyera Jîna Emînî veketîye, bûye sedemê têkoşîna hevpar a neteweyên bindest ên wekî Kurd, Belûc, Azerî, Ereban û yê din li hemberê serdestiya neteweya Faris. Rejîmê heta nûha nekariye raperîn û berxwedana jinan, ciwanan, xwendekaran, Kurdan û Belûcan biçewisîne, berûvajê wî hemû tebaqeyên xelkê Îranê tevli vî serhildanê bûne. Li rojhe-


latê Kurdistanê, bi bange-wazîya Navenda Hevkarîya Partiyên Kurdistanê gireveke giştî deşt pê kir, tevlibûn û piştevanîyeke baş ji aliyê xelkê ve hate kirin. Di deşt-pêkê da bi teybetî Kurd û Belûcan û herweha gurubên netewî yê din jî, ji bo azadî û serweriya xwe berdewamî li hemberê rejîma dîktator a Îranê têkoşiyane û tédikoşin. Rejîma teokratîk a Îranê li hemberê vî mixalefet û berxwedanê neçar maye, ji ber vî neçariyê êrîşê kampên sivil û baregayên sê partiyên siyasî yê rojhelatê kirin li ser xaka başûrê Kurdistanê, da ku bala raya giştî ya dinyayê ji berxwedana navxweyî ya xelkê Îranê dûr bixin û tevgerê ji rêya meşrû derbixin. Rejîma Îranê bi vî awayê, dixwaze berxwedana meşrû ya xelkê Îranê manîpile bike û li hemberê xelkê Kurd jî zemîna pîlana qetîlameke mezin çêbike. Heta îro di encama êrîşên dewleta Îranê de, nêzikê 150 kesên canê xwe

ji deşt daye, bi hezaran kes birîndar bûye û hatine deşt-gîrkirin.

Digel van kiryarên rejîmê, xelkê Îranê û rojhelatê Kurdistanê; ji bo mafê xwe yê millî, mafê demokratîk, mafê mirovî, mafê jinan û azadiya xwe têkoşînek rewa û bi îstiqrar dimeşînin. Piştevanîkirina berxwedaneke rewa, mafdar û bi îstiqrar mafekî mirovî ye û serbilindî ye. Di vî çarçoveyê de em bang li hemû raya giştî ya demokratîk û humanîtera dinyayê, rêxistina Neteweyên Yekgirtî, Yekîtîya Awrûpa, Konseya Awrûpa, Teşkilata Yekîtîya Ereban û rêxistinên din ên navneteweyî dikan ku piştevanîya berxwedana meşrû û sivil ya xelkê Îranê û rojhelatê Kurdistanê bikin. Li hemberê zordarî û qetîlamên rejîma despotîk helwesta xwe nîşan bidin û midaxaleyê wê bikin.

Ji bo vî yekê, em yê ku navê wan li jêrê hatine nivîsîn; êrîşên berdewamî û qetîlamên Dewleta Îranê şermezar dikan, piştevanîya têkoşîna berdewamî ya xelkê Îranê, rojhelatê Kurdistanê, hemû kom û gurubên netewî û etnikî yê Îranî dikan ku ji bo mafê mirovan, mafê jinan, mafê neteweyî, demokratîk û azadiyê tédikoşin.

Şoreşa azadiyê.. Şoreşa exlaqî



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem

Jîna(Mehsa)Emînî bi vê karesata nemirovane ya ku bi destê polîsê exlaq(geşta îrşad) a Îranê hat serê wê, bûye sembola şoreşê seran-serî li Îrana Îslamî a tundrew de. Ev Îrana melasan ku tenê jiber xuya kirina piçek por, cem wan gelek asay ye ku keçîkek di temenê xwe vejînê de jiyana xwe ji dest bide, lê cem wan gelek girane û asayî nine ku tewahiya neteweyekê ku tîniyê azadî û jiyane kêrhatî a mirovane ne, rijiyane ser şeqaman û daxwaza jiyane bikiramet bo tev civakê dikan.

Zordariyek pir mezin encam didin eger şoreşa ku niha li Îranê li gorê de ye, ji bo piçek vêdebirina xavikê, lê dikarin bêjin ku ev parçe xavika ku di nav de jin kiriye bi koyle û hêz û desthilat daye bi polîsek nexwandevan û gelek asayî û bi hêsanî arîşeyan bo jinekê çê dikan, heta eger xwadiyê bilindtirin bawerînameyê jî be, li ser şeqaman hîlbijêre û sivi-katiyê pê dike, da ku rapêçî binkeya polîsê exlaq(geşta îrşad) bike û cezayê girtîgehê bo bibire.

Ew ser parçe qomaşekê hikum nîwa neteweyekê dikan, ew parçe qomaş ku ti tiştek nake û nabe kevirê exlaq û başî û xirabiyê, çimkî mirovê misilman eger li bihuştê de be, ew kiriyar û başî û exlaqê wî ne ku deriyê bihuştê jêra vedike an dadixîne, nek parçe qomaşek.

Yaku niha li Îranê de li şona kuştina Jîna(mehsa)Emînî rû da, şoreşek asayî nine, belkû di raştîyê de şoreşê civakî ye bo guherîn û heqîqetê tal û tarî li rêya daxwazkirina jiyane birûmet û azadî bo



jinan e, kuştina Jîna neteweyên din yê Îranê jî wê yekê hişyar kir ku, eger li derheq wê kuştinê de bêdeng bin, ev yek jî dibe kultûrek asayî û dîr nine nekin bi yasa bo jiyane, êdî mesele siza dana wan çend polîsan nine ku, Jîna bi awayê dirindane bo hundrî tiromibîlê rakêşane, belkû mesele gelek jî wê yekê mezintir e ku, digihîje cezadana tewahiya desthilata şemkar.

Ya ku wê şoreşê cuda dike beşdariya bandordar û çalakaneya jinê di nerizayetiyan û xwenîşandanan de ye, bi havêtina xavikên xwe û şewtandina wan û piştîre birîna porên xwe, weke bertekek lojîkî bo redkirina tev reftarên hovane yê jî ber piçek por ku di bin xavikê de derkevtibe û jiyana jinê bixîne di metirsiya mirinê de.

Eva şoreşek nine ku bo azadkirina tenê jinê be, belkû şoreşê bo azadkirina tewahiya civakê û azadkirina wan mîrên azadîxwaz û pêşkevîxwaz e, mîrên ku bûne koyleya desthilatekê ku herçawan be bixwaze mejiyê wan bi komê nerînen paremayî biqelişî ne. Her wek ku sebebên ragihandinê dihatin dîtin û hejmarek berçav bi mirovên bitemen jî di xwenîşandanan de beşdarî dikan, çimkî wan mirovên bitemen di serdema berî wê desthilata melayan de jiyane û dikarin bi hêsanî wê jiyane û jiyana wî serdemî danin berhev, herwisa beşdariya gelek gencên ku temenê wan derdora 20 saliyê de ne, ev temenê ku di himbêza teknolojiyayê de jidayîkbûne û karîne şarezaya ezmûna jiyana neteweyekê din be û fêhm bikin ku ti demî wir hîcab wegirtinek nine ji bo wê ku deriyên bihuştê jî berahîka jinê de vebike.

Ewa di pileya yekem de şoreşerek li dijî reftarên ne exlaqî yê wê desthilata ku tev nîrxên mirovahiyê tevlihev kiriye û naşîrîn jî kiriye û jin li mirovahiyê xîştîye. Dikarin navê wê şoreşê bikin bi şoreşek bo anîna çavkaniya kirameta mirovahiyê di bin siya desthilatekê de ku êdî bo wî ti mifahek tune ku di wî serdemî de hikm bike û divê herin di nav mizgevtan de û tenê mejûlî pereşandina Xwedayê xwe be û dest bo siyasî û hikmdariyê nebe.

Helbet dîroka Îranê tîjiye li xwenîşandan û hewlên nerizayeti û rijiyana ser şeqaman, li sala 1988'an de xelk rijiyane ser şeqaman û daxwaza destkarîkirin li destûrê de kirin, li sala 1999'an de tevgera dersxwanan serî rakir, li sala 2009'an de Têvgera Kesk li serûbenda wê sextekariyê de li hîlbajrtinê de hat kirin ku Ehmedînîjad bo dewra duyem bo serkomar. Piraniya wan nerizayetiyan tiştek li Îranê de guherîn, wisa lê hatiye ku salane ev tevgeran û hewlên nerizayetiye dubare dibin, li sala 2017'an û 2019'an de tunditirîn xwenîşandan hebûn, û piştî kevtina Şayê Îranê li sala 1979'an de ku bû sebebê şehîdbûna 1500 mirovî û di encama bilindkirina nîrxê şewatê di sedsalên 50'î de bo jî sedî sed. Helbet piraniya wan nerizayetiyan de bo daxwazkirina destpê dikan û bi siloganan biherife rejîma melayan û daxwazkirina azadiya zêdetir dawî pê tê.

Nerizayetiyan wê dawiyê yê li serûbenda şehîdkirina Jîna(Mehsa)Emînî de, şoreşê bi tevahî civakî ye, ku naveroka şoreşê jin e, û li ser redkirina desthilata zal li ser jinê û sînor-darkirina azadî û hîlbajrtinê mirovan jî jiyane de tekez dike. Her bi wê sedemê ye ku dibînin Jîna(Mehsa)Emînî dibe sembole bo çewsandina jinan li ser navê ol û dibe mayeya kerb vebûna tev jin û mîrên civakê bi bê hebûna cudahiyeke.

Di raştîyê de wê şoreşê li dijî hîcabê serîrakiriye û encama wê kelegbûna ezmûneke tal a ji bindestîya desthilata melayan û rikeberiyên dom dirêj ku jiyana piraniya Îraniyan tevlihev kiriye, û tev bihevê û bi yek zimanî ev parçe qomaş dikan ku kirine alavek bo çewsandina jinan.

Li hember de jî ev şoreşa rûyê heqîqeta wê desthilatê jî wê yekê hilda ku dest li jinê neparaştîye û bi hemû şewazî li hember wan de disekine, ku di encamê de şewazek din bertek li pey xwe hebûye, û ev jî bilî şewtandina hîcaban, û dîlan kirin li ser şeqaman û li cihên giştî de, ji bo wê ku jî wê desthilatê tîbigehin ku wan azadî û jiyane kêrhatî hewce ye.

Rojhilatî bêgavî wê serbikevin.



N: Nuran Koyuncu

Xwepêşandan weke serhildanê li seranserê Kurdistan û Îranê didomin.

Li gorî nuçeyên Kurdistanê pasdarên rejîma melayan ji serê xwepêşandanan heta niha li serê 200 însanî kuştin, bi hezaran însan jî bi zorê û bi darê zorê revandin û cihê wan ne dîyar e.

Pirraniya wan Kurd û Belûcî ne. Metirsiya destdirejî û bi tehdeyî kuştina wan heye.

Weke Azerbecaniyan rêya berdana bi deştberîyê mixabin girtine, nikarin bi vê rêyê ve azad bibin. Ku ew rê vekiribe jî malbatên wan nikarin wê bedela giran bi peretî bidin.

Lewma jiyana bi hezaran însanan di talûkê de ye, mixabin li wan weke kuştîyan dibînin, ji bo wan xemake giran dikşînin.

Weke Kurdan Îranî jî li her devere li dijî rejîmê, ji bo rûxandina wê tevî mangirtînan dibin. Karker, xwendekar ajokar nerazîbûna xwe nîşan didin. Ciwan pêlîstîkên Hamaney, melayan li şeqaman bi stûnan darve dikin. Bi dawîya mella û rejîmê dîyar dikin.

Li zanîngehên sereke her diçin dengê xwe bilind dikin, serê xwe radikin. Ew nîşaneyên rûxandina rêjîmê ne...

Mehekê zêdetir e li dinê bi xwepêşandanan li welatê Şîlîyê bigre heta Kanadayê, ji Ewrûpiyê bigre Emerîkayê, ji



Rojhilata Navîn heta Avustraliyayê piştgiya Kurd û Îraniyan tên kirin. Ev hêviyek mezîna dide Kurd û Îraniyan.

Di wan xwepêşandanan de dirûşma bibandor ya sereke “Jin, jîyan, azadî” ye û li her deverê deng vedide. Li wan rojên dawî yê herî balkêş jî yek ji belûciyan derketiye “Kurdistan not Iran, Belûciştan not Iran”e.

Ya din li zanîngeha Shahrekurdê bi dengê bilind bangî hevgirtinê dike” Yek ku bê kuştin bi hezarên din jî bêne kuştin”. Herwiha hêzên ku pergala li dinê dikaribin biguherînin bo piştgiya nerazîbûnan gelek daxuyanî dan.

Dewleta Îranê ya li hemberî nerazîbûnan de bi tundî şermazer kirin, hişyarî dan rejîma melayan ku helwesta xwe ya tund biguherînin.

Li nav wan yê girîng tîndîtin ya li Parlemantoya Ewrûpayê û ya serokê Emerîkayê Biden in. Ji ber ku bi serkeftina Kurdan û Îraniyan ango serkeftina serhildanan bê piştgiya wan nabe.

Belê bi dehan dirûşmên bibandor û balkêş derketine hemû dirûşm “Kurdistan gorîştana faşîştan”e deştîştan

dike.

Çimkî rejîmê her car însanên Kurd li ber çavên dinê, li ber çavên zarokên wan bi dar ve dikir. Helbet deştîpêka rûxandinê jî li wê derê derkeve.

Welatê Kurdan nêzî hezar sal e, parçe parçe ye.

Kurd nêzî hezar sal e bê dewlet in, ku mirîtiyan nahesibînin. Her parçeyên wê tenê dilek lê dide. Êş û xema wan yek e.

Li wan rojên ku li şeqam li kolanên wê her gav xwîna Kurdan tê rijandin, Rojhilat e. Lê, dengê her sê parçeyên din an lawaz derket an jî bêdeng man.

Qet nabe li ser tora civakî dengê bilind derxistana lê nekirin. Sedemên bêdengiya wan çî ne ew mijara sîyasetmedar û derûnnas û civaknasan e.

Lê ya ku me fêhm kiriye, xwîşk û birayên xwe tenê hiştin. Siyasetmedar, hunermend, nivîskar, sazî bê deng man. Xwe ker kirin, Rojhilat tenê hiştin.

Lê, Rojhilat helwesteka xwe-bawer bi hişmendiya azadiyê serîhilda û rabû.

Rojhilatê Kurdistanê di

qonaxa “an man an neman”ê de ye û mecbûr e serbikeve.

Weke ku Kurd careke din bi wêrekî, bi îstîkrar, bê rawestan bi biryar rabûne li ser xwe bi mecbûr in çarenivîsa xwe biguherînin. Naxwazin îcar derfeta azadiyê ji deştî bîçe.

Lewma, her roj bi dengeke bilind li her derê diqîrîn. Bi bizav û dirûşmên nû ve agirê serhildanê zêde dikin. Dewsa şîna cangorîyan, ji pey cangorîyan dewsa girî û gazînan doza ruxandina rejîma xwînxwar dikin.

Dixwazin çarenivîsa xwe li deştên xwînxwar û dagirkeran derxînin.


Hêvî dikin û bi bawer in Rojhilatê tevahî Kurdên wê pêşeroja Rojhilata Navîn ronî bikin.

Wek roja îroyîn çawa ku pêşengiya Îraniyan kirin wê bi pêşengiya azadiyê jî bikin. Rojhilat bi rêxistinî ye. Şopa kal û pîrên xwe dikin.

Xwe serbilind dibînin êdî naxwazin di bin ala xwînxwaran de bijîn.


Weke her neteweyên din li ser axa xwe, dibin ala xwe de xwedî dewlet bin. Bi hêviya serkeftinê!

Nerîna Lîderan



“Karin Jean-Pierre:”

Berdevka Koşka Spî got: “Em li ser hemû bijardeyan berdewam in ji bo piştgiriya mêr û jinên wêrek ên Îranê ku ji bo mafên xwe têdikoşin.”



“Catherine Colonna:”

Wezîra karên derve ya Fransayê: Rûsiya bi berdewamiya şerê li dijî Ukraynayê, ewlehiya kolektîf a Ewropayê tehdîd dike.



“Zelensky:”

: Îran ji firotina firokeyên bê firokev-an bo Rûsyayê pereyê xwînê qezenc dike



“Elem El-Huda:”

Keça xapînok ku dema hilkişîya ser zinaran xavika xwe havêt û şeref abiroya nizamê li cîhanê de bir.

Biryarnameya xwepêşandanên piştevanîkirina serhildana xelkên Îranê li ye

Kuşîna keça Kurd Jîna Emîn li Tehranê, xwepêşandanên ji bo şermezarkirina tawana han li pey xwe ve anîn û bi hezaran kes li gelek welatên cîhanê, ew jî weke Kurdistanê û weke li Îranê, ji bajar û herêmên cuda daketin kolanan û xwestin Komara Îslamî hilweşînin.

Xwepêşandan û protestoyên serhildana Îranê berdewam in û ew dibêjin ku hêzên tepisîner ên Komara Îslamî hemû şeweyên tundûtûjiyê li dijî xwepêşanderên aşîxwaz bi kar tînin. Herwisa bi dehan sedan xwepêşanderan li Îranê bi teqeya rasteraşt ya hêzên rejîmê hatine şehîdkirin û bi hezaran kes jî birîndar bûne. Hêzên zordar ên rejîma Îslamî ji gaza rondikrêj heta guleyên şer û gelek şeweyên tepisandinê yên din li dijî gel bi kar tînin. Di encama tundûtûjiyan de bêtirî 200 kes di serhildanê de hatin şehîdkirin û bi sedan kes birîndar bûne. Li gor ku Rêxistîna Efûyê ya Navnetewî dibêje, di nava kesên ku jiyana xwe ji dest dane de herî kêr 23 zarok jî hene.

Li gel zêdebûna pêla nerazîtiyan jî, Komara Îslamî li herêma Kurdistanê dest bi teror û êrîşa dewletî li dijî hêzên opozîsyona Kurd kir û roja 6 cotmeha îsal jî bi dron û mûşekên balîstîk êrîşî ser baregehên hêzên Kurdistanê li Îranê kir û di encamê de herî kêr 17 kes hatin şehîdkirin ku di nav wan de jin û zarok jî hebûn û gelek kesên din jî birîndar bûn.

Hêzên navbirî yên rejîma Komara Îslamî roja 9'ê Cotmehê li bajarên Sîstan û Belûcîstanê êrîşî ser xwepêşandanên aştiyane yên gelê Zehidanê kirin û di encamê de zêdeyî 100 kes di serhildêran jiyana xwe ji dest dan. Hin ji kesên jiyana xwe ji dest dane, zarokên kêrî 18 salî bûn ku yekser gule li wan hatin reşandin.

Hêzên zordar ên Komara Îslamî li Tehranê jî êrîşî zanîngeha Şerîf kirin û çend demjimêran zanîngeh dorpêç

kirin. Ew jî piştî protestoya xwendekaran û bi danîna kemînan ji bo xwendekarên dihat û tê de di encamê de hejmareke mezin ji xwendekaran hatin binçavkirin û ji wan xwendekaran jî li wir hatin birîndarkirin.

Tawaneke din a Komara Îslamî êrîşa li ser girtîgeha Êvîn a li Tehranê bû. “Êvîn” bi kiryarên dijmirovahî yên li dijî girtiyên siyasî û çalakvanên biyanî yên ku di zindanê de tînin ragirtin navdar e. Tê gotin ku bi sedan welatîyên binçavkirî yên vê dawiyê jî li vê girtîgehê ne. Di encama vê êrîşê bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan.

Mafê jiyana azad, jiyaneke bi rûmet û hebûna mafên siyasî û civakî, beşeke binge-hîn a mafên mirovan ên vê serdemê ye. Mafê ku ev 43 sal in ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve tê zewtkirin û ji gelên Îranê hatiye standin.

Niha ku em li vir kom bûne, piraniya bajar û deverên Îranê ji Kurdistanê heta Belûcîstanê, ji Ehwezê heta Azerbaycanê, ji Gîlanê heya Tehranê, Îsfahan, Meşhed û bajarên din bi tundî ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve tînin tepisandin û her kêlî em şehîdkirina kesekî ji aliyê rejîmê ve dibînin. Komara Îslamî hemû riyên têkilîdanîna bi mirovên derveyî Îranê re jî girtine. Niha gelek dijwar e ku bi bajar û navçeyên cûrbicûr yên Îranê re têkilî çê bibe û Komara Îslamî ya Îranê bi qutkirina internetê û rêyên din ên girêdana gel û çewisandina rapêrîna gelên Îranê hewl dide ferzkirina dîktatoriya xwe li ser gelên Îranê bidomîne.

Rejîmê di nava zêdetirî 40 salên xwe de hem li hundir hem jî li derveyî welat xwe ji ti sûcî neparaşt. Di hundir de bi darvekirin, girtin û binçavkirina mirovan jiyana xwezayî, azad û bi rûmet ji gelên Îranê standine. Ev rejîm li derveyî Îranê her tim piştgiriya têrorê dike û bi

rêxistinkirina komên tundrew bûye metirsiyeke mezin li ser ewlehiya welatan û aştiya cîhanî.

Dirûşma “Jin - Jiyan - Azadî” bûye sembola têkoşîna neteweyên Îranê û hemû çînen civakê li dijî wê desthilata dîktator û hemû netewe, kêmneteweyên netewî û olî yên Îranê ku Kurd, Fars, Tirk, Belûç, Erebi, Turkoman, Beha'î, Sunî û yên din in, bi yekdengî dixwazin rejîma Îranê hilweşe û hikumeteke demokratîk li ser bingeha Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan were avakirin. Ji ber vê yekê em beşdarvanên van xwepêşandana li Ewropayê, ji bilî piştgiriya serhildana gelên Îranê ya li derveyî welat û civaka navnetewî, hêvî dikin ku;

1. Dorpêçeke aboriyê ya di-jwartir li dijî berpîrsên rejîma komara Îslamî û hêzên çekdar daynin

2- Balyozên Komara Îslamî ji hemû welatan bihên vexwez-tin û balyozxane û navendên rejîmê li ewan welatan bêne girtin.

3- Givaşê li Îranê bikin da ku erkên xwe yên navnetewî ya rêzgirtin li mafên mirovan û danezanên Neteweyên Yekbûyî bicî bike.

4- Gerek hêzên pasevanên rejîma Îslamî ya Îranê ku rolek mezin di kuştin û serkurtkirina xwepêşanderan de hebûye, bikeve nava lîsta rêxistinên terorîstî de.

Dem hatiye ku welatên cuda yên Yekîtiya Ewropayê bibînin ku rejîma Îslamî ya Îranê ji bo ewlekariya Ewropayê gefeke gelek mezin e. Rejîma Îranê bi şandina balafirên bêpîlot û fuzeyên bisîkletan ji bo Rûsyayê jî, yekser di kuştina Ukrayniyan de tawanbar e ku bi biryarnameyên navneteweyî de hatiye redkirin.

Ewropa- Xwepêşandanên ji bo piştivaniya serhildana xelkê Îranê

Gelo we heye «Sihr li dijî Sihrbaz biqulibê»?



N: Ebdûlazîz Qasim

Senaryoya kontrolkirina Herêma Efrînê ya dagîrkirî ji aliyê “Heyet Tehrîr el-Şam” ya girêdayî “Rêxistina Elqaîdê” di 12ê Cotmehê de, nayê cudakirin ji lihevhatina vê dawiyê ya di navbera rejîma Sûriyê û Tirkîyê de, ku yek ji encamên civîna sêqolî ya Tehranê ye, ya bi beşdariya serokên Rûsiya, Tirkîya û Îranê di 19’ê Tîrmeha borî de hatibû lidarxiştin.

Herwisa ev senaryo nayê cudakirin ji civînên piştî civîna Tehranê, nemaza civîna Soçî li 5’ê Tebaxê di navbera Serokê Rûsyayê Vladimir Pûtîn û yê Tirkîyê Recep Teyip Erdogan de, ku tevî endamtiya Tirkîyê di NATO de, lê di pratîkê de pêtir nêzîkî hevpeymanîya Rûsiya û Îranê ye, nemaze ku Tirkîya wek dewleteke dagîrkerê kurdîstanê dijminatîyek hevbeş li gel Sûriyê, Îran û Iraq li dijî gelê Kurd heye, tevî ku opozîsyona Sûriyê (Îtîlaf û desteya danûstandinan) ku navenda wê li Stenbolê ye, ku ew jî girêdayî vê dijminatîya hevbeş ya dijî gelê Kurd û rojeva Tirkîyê bi tevahî pêrew dike, lê tevî wisa jî dixuye ku radeştîkirina Efrînê bo Heyet Tehrîr El-Şam, bi awayekî tê bi sedema derketina xwepêşandanan li dijî daxuyanîyên Tirkîyê yên derbarê başkirina peywendiyên Tirkîyê û Sûriyê li navçeyên di bin kontrola Tirkîyê de li Efrîn, Îzaz û Babê ..., herwisa bi armanca neçarkirina Îtîlafê û desteya danûstandinan bo qebûlkirina lihevhatinê li gel rejîma Sûriyê.

Raşt e, ku civîna Tehranê hat wekî civînek sê-alî di çarçoveya civînên Aştana de yên derbarê doseya Sûriyê



di navbera wan her sê welatan de, lê lidarxiştina civîna Tehranê yekser piştî serdana Biden bo Rojhilata Navîn, û beşdariya wî di Lûtkeya “Cidde” de ya ji bo ewlehî û hevkarîyê di 15-16 Tîrmehê de û piştî êrîşa Rûsiya li ser Ukraynayê, ku wisa xuya bû ku sedemên raştîn yên civîna Tehranê di demê xwe de, ji hevahengîya li ser Sûriyê pêtir û dûrtir bûn, û bi dîtina ku tiştê niha li Efrînê diqewime raştêr bi vê hevahengîyê ve girêdayî ye û herwiha ku serdana tevgera Hemas ya Fîlîstînê bo Şamê (19ê Cotmehê) dikeve di heman çarçoveyê de, nemaze piştî seredana serokê polîtbyuroya tevgera “Hemas” Îsmâil Henîyê bo paytexta Rûsiya Moskoyê, roja 3ê Îlonê, hevdem ku li gorî hin raporên rojavayî behsa vegerandina têkiliyên navbera Hemas û Sûriyê dikin, ku di raporteke ya International Economist de hatibû ku Hemas di nav axa Fîlîstînê de lawaz bûye û bi rêya têkiliyên xwe yên li gel Şam û Tehranê hewl dide ku pêgeha xwe vegerîne.

Netenê Hemas Lawaz bûye, herwisa Hizbulah lawaz bûye wekî xuya bû di helbijartinên Lubnanê de yên îsal, û tevî şikeştina alîgirên Îranê li Îraqê di helbijartinên 2021’an de, herwisa ku cemaweriya AKpartî li kêmê deye, lewra ev hemû alî hewl didin hêza xwe vegerînin û piştî têkçûna têkiliyên Rûsiya li gel Ewropa bi sedema şerê li dijî Ukrayna, Rûsiya jî hewl dide hejmongeriya xwe li Rojhelat Navîn zêde bike, û ji bo vê yekê hewl dide têkiliyên xwe bi Tirkîyê û Îranê re bihêztir bike, û dibe ku nêzîk lihevhatinek di navbera rejîma Sûriyê û grûpa Al-ixwan Mislimîn de çê bibe, bi navbeynkariya Hemas û Tirkîyê, bi heman awayî dibe ku li Îraqê jî grûpên Îslamî yên “Sinî” li gel grûpên alîgirên Îranê rêkbikevin, tevî şandina peyamên nerim bo Îsraîlê, wek razîbûna Hizbulaha li ser diyarkirina sînorên deryayî di navbera Lubnan û Îsraîl de, û pîrozbahîya Hemas jê re.

Tiştêk xwezayî ye, ku ev dewletên dagîrker û mirovkuj li gel rêxistinên terorîst û tundrê rêkbikevin, lê di heman dem de dibe ku textê wan li ser piçûktirîn bûyer bi helweşe û têkbiçe, wekî serheldana îro ya li Îranê û Rojhelatê kurdîstanê û heta Beloçîstan ..., ku îro pêtir ji heyvekê heye ku xelkê Îranê li dijî rejîma şemkar, bi dirûşmên bimire dîktator, bimire Xamînayî derdikevin, û rewşa rejîma Îranê gelekî sişt û leq bûye û ber bi dawîya xwe diçe û ziyaneke mezin lê ketiye, û helbet li gel berdewamiya serheldana xelkê azadîxwaz li dijî vê rejîma şemkar û mirovkuj, dê terazû û hev kêşeyên herêmî û navdewletî bo qazîna xelkê navçeyê û qazîna gelê Kurd li tevaya Kurdistanê bêne guhertin û wekî tê gotin ku “dê sihr li ser sihrbaz biqulibê”.

Ebdulhicab :“Serlihdana di çedhefteyên derbasbûyî yên Îranê em dikarin bêjin ku ji Kurdistan îlham wegirtiye”



Ebdulla Hicab:
Çalakvanê siyasî

Min digel rêzdar Ebdulhicab li derheq xwenîşandanên Rojhilatê Kurdistan û Îranê hevpeyvîn kirin navbirî got: “Serlihdana di çedhefteyên derbasbûyî yên Îranê em dikarin bêjin ku ji Kurdistan îlham wegirtiye”.

P: Rêzdar Ebdulhicab hûn rewşa serhildana xelkê Kurdistanê Rojhilat û Îranê çawa dinirxînin?

B: Serlihdana di çedhefteyên derbasbûyî yên Îranê em dikarin bêjin ku ji Kurdistan îlham wegirtiye û yek ji serhildanên herî berfireh û herî siyasî û herî demokratîk di wan 40 çend sal temenê rejîma Îslamî a Îranê de em dibînin û şahîdê vê ne û ev serhildan û şeweya ku gel tê meydana û siloganên gel didin hevbendiya ku heyî û xebata ku xelk bi awayê hevterîb dimeşîne, nîşan dide û xelkê Kurdistanê gihîştîye asta bilind a hişyariya siyasî û hişyariya neteweyî, daxwazên xelkê rewane û daxwaziyên xelkê digel pîvanên mafê mirov û pîvanên demokrasîyê hevdigrin û li ser vê felsefeyê jî digel komara Îslamî hev nagirin û ev jî bûye heger ku rejîma Îslamî bi awayek wisa hov û bi şidet li hember xelkê medenî de disekine û ya destê wê tê dike bona ku ev xwepêşandan bîn sekinandin û bi lêdan bi gef û bi kuştin û bi girtin û bi hemû şewazyî tunditîjîyê dixwaze xelkê bitrisîne û xelkê dûr bixîne û iv cihê kêfxweşiyê ye ku serhildana niha serhildana gen-

can e û serhildana nîfşa nû ye û ev serhildana nû serhildana jina ye serhildana cuda ye ev xebeta ku heta niha hatiye meşandin, lê berdewamiya vê xebatê ye û berdewamiya vê xebetê berdewamiya demokratîk e, lewma jî rejîm gelek ji vê ditirse. Girîng e yaku niha em dibînin Kurdistan bû pêşeng bo serhildana seranserî li Îranê, rejîma Îslamî ev 40 û çend sal in Kurdan li pêş çavên gelên din yên Îranê reş dike û bi awayekê nîşan dide ku Kurd û xebata Kurdan daxwaziyên Kurdan digel daxwaziyên hevbeş yên neteweyên Îranê hev nagirin, lê xebata vê carê ku hat kirin, şeweya serhildana xelkê şeweya daxwazên xelkê Rojhilatê Kurdistanê piştigîriya seranserî bi xwe re anî û em li derveyî Kurdistanê dibînin, hemû parêzgehên ku neteweyên derveyî bazneya desthilatê wir in hem jî li Tehran û li navendên din, li Qumê, li Meşehedê, li Şîrazê û li gelek bajarên din bajarên mezin yên Îranê piştevanîyek befireh bo daxwaziyên gelê Kurd heye û dema ku em dibêjin Kurdistan çav û ronahiya Îranê ye tê vê wateyê ku Kurdistan pêşeng e û ev jî bingeha vê xebatê bingeha xebata 43ê salên derbasbûyî ye yanî li ser mîrata 43ê salan hatiye damezirandin 43ê sal xebata siyasî û xebata neteweyî û niha li Îranê jî deng vedide û ev serkevtineke mezine, pêşveçûnek mezine bo tevgera Kurd û di heman demê de şikestînek mezine bo rejîma Îslamî, lewma jî rejîma Îslamî bi wî awayî har bûye li hember daxwaziyên xelkê Kurdistanê de

P: Rêzdar Ebdulhicab ji dîtingeha we erkên partiyên Rojhilatê Kurdistanê derheq baştir kirina xwenîşandanên seranserî yên Kurdistan û Îranê de çawa ye?

B: Ya girîng e ku partiyên siyasî hevrêzî û hevdengî û hevkewestiya ku heta niha nîşan dane berdewam bikin û bighîjin asta hevdengîyek



zêdetir û bigihîjn asta platformek siyasî ya hevbeş û partiyên siyasî dikarin bibin deng û rengê xwenîşanderan jiberku rejîma Îslamî bi hemû şiyana xwe hewl dide xelkê bêdeng bike, rê nede ku hawara gel hawara xelkê bigihîje derveyî welat, bigihîje rêxistinên navneteweyî, bigihîje civaka navneteweyî, ji aliyek din ve jî partiyên siyasî dikarin platformek siyasî çê bikin ku, gel bawerî pê bike, platformek hevbeş a siyasî ku gel bizane partî amadene bona vê yekê bîn û di paşerojê de çarçoveyek siyasî pêk bînin ku mafê gel misoger bike û bibe pişt û pena bo xebata navxweyî welat.

Rejîma Îslamî ev 43ê sal in ku partiyên siyasî yên Kurd bi vê yekê tawanbar dike ku dixwazin Îranê perçe bik in, bi awayekê dixwaze wisa nîşan bide ku ev partî dijî siyasîvanîyê ne, ev partiyên çekdar in, partiyên siyasî niha di pratîkê de nîşan dane ku hêviyek in, hêviyek in heta bo xelkê Îranê, jiberku opozisyona Îranê opozisyona seranserî ji hev belave û partiyên Kurd hevgirtî û hevhelwestin û nîşan dane jî ku di navxw-

eyî welat de piştigîrî hene, ev piştigîriya hêviyekê dide, netenê neteweya Kurd belku neteweyên din yên Îranê jî partiyên siyasî yên Kurd ezmûna xebata demokratîk jî hene û ezmûna berxwedana berdewam û dirêj jî hene û ev yek jî hêviyekê dide xelkê xwe, platforma siyasî ya ku hêzên siyasî yên Kurdistanê, partiyên siyasî yên Kurd têde bin, otomatîk dikare bibe platformek demokratîk, dikare bibe platformek ku tê de mafê mirovan misoger bibe, dikare bibe platformek azadiya jinê, mafê jinan mafê zarokan tê de bê misoger kirin, ji ber ku 43ê salin ku partiyên siyasî yên Kurd bo demokrasîyê bo wekheviyê bo azadiyê bo mafê jinan tekoşênê dikin, ev tekoşin bingehek xurte bo platformek siyasî bo pêşerojek din jî, berdewamiya xebata partiyên siyasî yên Kurd û derbaskirina vê xebatê bo qonaxa karê hevbeş, bo qonxa bêjim eniyek hevbeş, cibheyek hevbeş dikare zêdetir hêviyê bide xelkê Kurdistanê dikare zêdetir hêviyê gelên din yên Îranê.

P: Helwestên partiyên Rojhilatê Kurdistanê heta

»»»Dom R:10

»»»Doma R:9
niha cawa bûne?

B: Bi nerîna min partiyên siyasî yên Kurd heta niha gelek bi hişyar û bi awayek jîr tevgeriyane û ji aliyekê nîşan dan ku hev helwest in digel ku rêbazên siyasî cuda bin, heta şeweyên xebatê cuda bin jî, lê bi yekdengî helwest girtin li hember rewşa niha û nîşan dan ku ev dikarin digel ku nerînên cuda hebin hizr û ramanên xwe yên siyasî helwesta xwe ya siyasî bikin bi yek ev hêviyek da xelkê û bangevazek jî kirin daxwazayek kirin ku gel piştigîrî jê kir, daxwazî daxwaziyeke adilane bû, daxwaziyeke demokratîk bû, daxwaziyeke xelkî bû jî, yanî daxwaziyeke wisa piçîde yan bêjim tevliheviya siyasî nebû, daxwaziyeke sade û di heman demê de jî, ji civak û ji xelkê nêzik bû, lewma jî xelkê wisa bi awayek berfireh piştigîrî jê kir. Partiyên siyasî yên Kurdistanê bi awayekê tevgeriyan ku atmosfera siyasî, cewa siyasî aloz nekin û ev jî bû sedema vê ku gel zêdetir bivêr be, zêdetir bicesaret be, û li hember rejîmê de bisekine, rejîmê jî ev hinceta ku hez dikir û dixast bikeve dest, bona vê ku bi awayek tunditîj û zêdetir navxweyî welat de tevbigerê, partiyên siyasî yên Kurdistanê ev hincet nedan destê rejîmê, qorbanî dan, kevtine ber êrîşa hovane ya balafirên bê balafirvan, lê di heman demê de jî, helwesta xwe ya siyasî xurt kirin, helwesta xwe ya civakî xurtkirin, helwesta xwe ya navneteweyî xurt kirin, piştigîriya navneteweyî bidestxistin û piştigîrî dan gelê xwe piştigîrî dan navxweyî welat, lewma jî helwesta wan helwesteke berpirsane û bivêrane û jîrane û siyasyane bû, ev nerîn bo hemû partiyên siyasî her bi awayî ye, partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê gelek jîrane tevgeriyan û ev jîriya wan ya siyasî bû ku bo sedema vê yekê ku rejîm wisa bitirse û niha jî rejîm hemû hewlî dide ku di astên neteweyî û navxweyî de dixwaze wisa nîşan bide ku partiyên siyasî yên Kurd tunditîjiyê

digerin, lê partiyên siyasî yên Kurd nîşan dan ku helwesta rejîmê helwestek şaş e û hem di asta navneteweyî de nîşan dan û hem di asta seranserî ya Îranê de, hem di asta Kurdistanê de, ev jî bû palpişteke mezin bo serhildana demokratîk ya navxweyî ya welat ya niha û bi sedema vê ku rejîm bi awayek bigihîje binbesta siyasî ku nekaribe hinceta peyda bike, birîna hinceta li rejîmê serketina mezin bû li gor nerîna min bo partiyên siyasî yên Kurdistanê bi giştî.

P: Hûn rewşa rejîma ku niha bi tunditirîn şeweyî digel xwenîşanderan reftar dike çawa dibînin?

B: Rejîma komara Îslamî, digel ku bi awayek rûkeş wisa nîşan dide ku bawerî bi xwe heye wisa nîşan dide ku natirse, wisa nîşan dide ku her tişt di bin kontirola sîstemê de ye, lê di nava tirs û fikarên mezin de ye. Di nava wan 43`ê salên derbasbûyî de rejîmê gelek alêngarî dît, şerê Îran û Îraqê dît, êrîşên Mucahidîn û Çirikan di salên destpêka serkevtina serhildanê û an jî bêjîn mela hatine ser kar bi awayekê kevtine ber êrîşên tunditîjiya Mucahidîn û rêkxistinên din û ew dît, weke din serhildanên cuda cuda dît, qeyrana aborî dît, di nava wan sê û çar salên derbasbûyî de sê û çar serhildanên berîn dît, lê çi ji wan hindî serhildana vê carê rejîm netirsand, çi ji wan hindî serhildana vê carê rejîm nexiste nava tengasiyê û çi ji wan hindî serhildana wê dawiyê rejîm nexiste rewşekê ku beşek ji moreyên wê birevin û jê dûr bikevin.

Ew tirs bû heger ku hemû karbidestên rejîmê, karbidestên sereke, berpirsiyarê ewlekariyê serok û serkirdêyên Spah, artêş û hêzên din yên serkutker bi awayek yekdeng hatine meydanê û gotin, bi awayeke eşkere îtiraf bi hindê kirin ku niha tevgera Kurd hêzên siyasî yên Kurd e, ku di rojeva siyasî de di Îranê de diyar dike. Yanî li hember wê serkevtina tevgera siyasiye Kurd û rojeva siyasî ya Îranê girte destê

xwe ew hatne meydanê û ew karbidestên rejîmê hatne meydanê bi awayekî berfirawan gotin ku divê karekê bikin, gef kirin di piratîkê de êrîşkirin, hemû nîşana hindê ye ku rejîm zebûn bûye, tirsîya ye, li hember vê serhildanê û dizane ku destpêşxeriya vê serhildanê di destê tevgera Kurdî de bû, wê hindê ditirse.

Ew cara yekê ye em dibînin rejîm û karbidestên wê yê herî serwe hawara xwe dibîne rêkxistinên navneteweyî yên di asta navnetewî de hawar dikin dibêjin ku hêzên Kurd an hêzên siyasî yên Kurd navtêdanê dikin û xelkê tînine ser kolanan û êrîşî ser rejîmê dikin, civaka navnetewî dizane ku rejîm derewan dike û xelkê Îranê bi giştî dizane ku rejîm derewan dike, lê ya ku rejîm îtiraf dike, hawar dike li her derî dibêje ku niha ketiye ber êrîşan, nîşana vê yekê ye ku rejîm zêde tirsîya ye û di wan 40 û çend salên desthilata Komara Îslamî de cara yekê ye ku rejîm amadebaşiyê seranserî dide hemû hêzên xwe digel ku hemû hêzên xwe neanîne kolanan hîn digel ku hemû hêzên xwe li hember gel de nedane bikaranînê jî, lê amadebaşiyek sedî sed hene ji ber ku dizanin derdorên wê lêhildiverin û dizanin gel rejîmê naxwaze û ji ber ku dizane rejîm li serewjûrdayîkê û ji navçûnê deye, ew jî nîşaneyê hindêye ku hereketa niha hatî kirin hereketek berfireh û mezin e, hereketeke ku koka wê di nava civakê deye, di nava dilê civakê deye, û bêjîn şax û pelgên wê di destê ciwanên ku taze hatine qadan de ye, ji ber wê ye ku rejîm gelek ditirse.

P: Gotina we ya dawî bo xelkê Rojhilatê Kurdistan û Îranê li ser silogana jin, jiyan, azadî çiyê?

B: Gotina dawî eva ku niha xelk li qadan e, serhildanek berîn he ye ew serhildan bûye pêşeng bo xebata siyayî li asta seranserî ya Îranê ev şanaziyeke mezine bo gelê Kurdistanê ev şanaziyeke mezine bo siyaştvanên Kurd ev şanaziyeke mezine bo

tevgera siyasî li Kurdistanê ku bi wî awayî kariye niha daxwaziyeke xwe yên siyasî bike daxwaziyeke hemû welat, nîşana hindê ye ku daxwaziyeke siyasî yên Kurd di 40 û çend salên derbasbûyî de daxwaziyeke rewşa û berheq bûn, teblîxatên rejîmê û teblîxata neyarên Kurdan li hember Kurdan de vala derket in. Silogan niha gelek in, neman bo dîktatoriye û siloganên din lê ya herî girîng niha silogana “Jin, Jiyan, Azadî” ye, ew semboleke ev tenê gotinek nine, di vê siloganê de yeksanî he ye, demokrasî heye, mafê mirovan he ye, azadiya jinê heye bi kinasî jiyanê nû, civakeke nû, û pêşerojê nû heye. Ew silogan, li silogana partiyê siyasî, rêkxistinê an kesekî derbasbûye bûye û bûye silogana neteweyekê an çendîn neteweyan û ya herêmekê û ya welatekê. Ew silogan çavkaniya wê Kurdistanê xebata siyasiya Kurd e, ya neteweya Kurd e, û niha bûye silogana Rojhilata Navîn û li sernaserê Îranê hawara wê tê kirinê, ev pêşengiyetiyê ku di salên pêşiya me û di demên pêşiya me ye, nîşan bide ku çavkaniya azadiya Îranê, azadiya Rojhilata Navîn guhertinên bingeîn li Rojhilata Navîn rênêsanseke nû li Rojhilata Navîn û li herêma ku em lê dijîn ji Kurdistanê bû, û ew jî bi nerîna min bi hindê ve girêdayî nîne ku serhildana niha ya ber bi kuderê ve here, serhildana niha çi bigihîje asteke ku rejîmê helwestê, û çi niha bo demekê bê sekinandin û carek din were qadên xebata siyasî, lê rojek li rojan yê serbikeve û bi vê siloganê serbikeve “Jin Jiyan Azadî” nîşana daxwaza neteweyekê, çendîn neteweyan, welatekê, herêmekê an hemû Rojhilata Navîn bona guhertineke nû ya ku digel rewşa heya niha em têde bi tewahî cuday e, guhertinek ku di bingeha xwe de edalet heye, mafê mirovan û mafê yeksan û demokrasî he ye.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Qedera “Xebat Fedayî” nexuya ye

“Xebat Fedayî” piştî 25 roj ji binçav kirin, heta niha qedera navbirî li girtîgeah Êvînê nexuya ye û di vê heyamê de, tenê carekê peywendiya telefonî digel malbata xwe girtiye.

Çavkaniyeke agehdar di vê derheqê de bi ajanda “Kurdpa”yê re ragihand: “Ew hunermendê Kurd li heyama binçavkirinê ji mafê hevdîtin digel malbata xwe hatiye bêparkirin û malbata navbirî ji aliyê hêzên ewlehî ve di bin givaşên tund de ne.

Herwisa wê çavkaniyê da zanîn ku hêzên ewlehî maşîn, perê hesaba bankî ya wî û hevjinê navbirî zevt kiriye.

Çavkaniyeke agehdar a “Kurdpa”yê bas ji wê jî kir ku hemû rojê hevjinê “Xebat Fedayî” serdana girtîgeha Êvînê dike, bona agehdarbûn ji qedera hevjinê xwe, lê wezîfedarên girtîgehê bêrêziyê bi wê dikin.

“Xebat Fedayî” xelkê gundê “Boriyer” ê girêdayî bajarê Sewlava û rûniştîyê bajarê Tehranê ye û ji rêkevta 4`ê Rezberê ve, li bajarê Tehranê hatiye binçavkirin.

Rewşa tendirûştiya “Peyman Gulabî” nebaş hatiye ragihandin

“Peyman Gulabî” temen 28 salî û dixtorê ajelan û xelkê bajarê Mehabadê ye, êvareya roja Çarşemî 20`ê Rezberê, bi sedema teqeya hêzên ewlehî hat birîndarkirin û piştî lêdan û îşkenceyek zêde, hat binçavkirin.

Çavkaniyeke agehdar li derheq rewşa tendirûştiya “Peyman Gulabî” bi ajansa “Kurdpa”yê re ragihand: Rewşa tendirûştiya navbirî nebaş e û niha li girtîgeha Îtîla`ata Spahê di bajarê Mehabadê de ye.

Herwisa “Aso Gulabî” birayê Peyman ku rûniştîyê welatê Norwêjê ye ji rêya vîdyoyekê ku bo cara yekem li “BBC”yê hat belavkirin, ragihandiye ku hêzên ewlehî li yek ji şeqamên nêzîk ên mala wan ji piştive bi çeka nêçîrê teqe ji peyman kirine.

Pêka gotina şahîdan, hêzên ewlehî piştî birîndarkirina wî welatîyê, bi awayek dijwar navbirî dane ber lêdan û îşkenceyê.

Herwisa “Aso Gulabî” got: Tu kesek ji qedera birayê min agehdar nîne heta paşnîvroja roja Înê, wezîfedarek digel malbata min peywendiyê digre û bi wan re radigihîne ku serdana nexweşxaneyê bajarê Mehabadê bikin û piştî dana pereyê nexweşxanê, termê Peyman verbigrin.

Birayê Peyman ragihand: Malbata min perê nexweşxanê didin lê ti tiştêk bi wan re nayê dayîn û bi wan re gotine ku lêre nemînin û serdana Îtîla`atê bikin. Piştî malbata min agehdar dikin ku Peyman bo bajarê Urmiyê tê veguhaştin û piştî bo nexweşxaneyê bajarê Miyandavê hatiye veguhaştin.

“Aso Gulabî” herwisa da zanîn ku, paşnîvroja roja Şemî digel malbata min peywendî girtine ku bona dana xercê nexweşxanê serdana nexweşxaneyê bajarê Miyandavê bikin, piştî ku çûne nexweşxana Miyandavê bi wan re gotine ku Peyman sax e û ji Îtîla`ata Mehabadê verbigrin.

Di dawî de “Aso Gulabî” pêka gotina şahîdekê da zanîn ku herdu pêyê Peyman û deştê raşt, çen, henek, didan, ser û difna wî şikeştine û 15 saçme ber ceştê wî kevtine.

“Ramîn Fatêhî” yek ji binçavkiriyan serhildana seranserî canê xwe ji deşt da

“Ramîn Fatêhî” kurê Baqir û xelkê bajarê Sineyê yek ji binçavkiriyan serhildana seranserî di girtîgeha Wezareya Îtîla`atê de canê xwe ji deşt da

“Çiyako Fatêhî”, birayê Ramîn li gotûbêjekî digel “Kurdpa”yê tevî piştraştîkirina nûçeya canjidestdana birayê xwe li girtîgehê, got: Roja Înê 29`ê Rezberê bi malbata me re ragihandin ku Ramîn di girtîgehê de bi sedema xwekujîyê canê xwe ji deşt daye.

“Çiyako Fatêhî”, tevî redkirina îdi`aya hêzên ewlehî li derheq xwekujîya Ramîn da zanîn ku ji rêya çavkaniyeke cihê baweriyê ve hatin agehdarkirin ku Ramîn bi sedema îşkenceya dijwar a hêzên ewlehî canê xwe ji deşt daye û hêzên ewlehî termê Ramîn bi bê agehdarkirina malbata wî li goriştana Mihemedî ya bajarê Sinê bi axê spartine.

Herwisa navbirî got: Hêzên ewlehî telefonên endamên malbata Fatêhî zevt kirine û gef ji wan xwarin ku li wê derheqê xwe ji hevpêvîn digel medyayan biparêzin.

Di dawî de “Çiyako Fatêhî” da zanîn: Hêzên ewlehî herwisa gef ji malbata navbirî xwarine ku wan mafê birêvebirina rêûresma sersaxiyê nîne.

Roja 21`ê Rezberê “Ramîn Fatêhî” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî bo cihek nexuya hatibû veguhaştin.

“Rada Fatêhî û Vurya Fatêhî” xwîşk û birayê “Ramîn Fatêhî” ji aliyê hêzên ewlehî hatin binçavkirin û heta niha ti zanyariyek li derheq cihê ragirtin û qedera wan ber deşt nîne.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (432)

ŞEQAM MEYDANA SERKEVTINÊ YE

